# Li dijî bêdengiyê bangewazî



Hevseroka KCD'ê Leyla Guven ji bo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were rakirin 51 roj in di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ye. Bi heman armancê li girtîgehên Kurdistan û Tirkiyeyê 64 girtî di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ne û 600 girtî jî di greva birçîbûnê ya dorveger de ne. Li Strasboûrgê jî greva birçîbûnê di roja 12'emîn de ye. Platforma Li Dijî Tecrîdê Azadî li hemberî bêdengiyê banga hestiyariyê li hemû kesî kir... *RÛPEL - 3*

**GREVA BIRÇÎBÛNÊ DI ROJA 51'EMÎN DE YE**


# e-rojname

28 Kanûn - În 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 218


## Sala 2018'yan

**Wexta behsa sala 2018'yan were kirin, gelo bi giranî kîjan mijar dê were bîra mirovan? Hema di serî de mijar û bûyera herî girîng a di destpêka salê de, di rojên Newrozê de pêk hat; êrîşa dagirkeriyê ya dewleta tirk a li dijî Efrînê dê were bîra mirovan. Di dawiya salê de jî, biryara Trump a vekişînê dê were bîra mirovan...** *Nivîsa Ahmet Aktaş / R.3*

# ROBOSKÊ TU CARAN NAYÊ JIBÎRKIRIN

**Bi fermana hikûmeta AKP'ê li Roboskê 34 kes bi balafirên şer hatin qetilkirin. 7 sal di ser komkujiyê re der bas bûn û kujer hê jî li ser kar in. Ger 700 sal jî derbas bibe kurd tu caran vê hovîtiya dewleta tirk ji bîr nakin**



### KUJERÊ ROBOSKÊ HIKÛMETA AKP'Ê YE

Bi fermana serokê AKP'ê Tayyîp Erdogan di êvara 28'ê kanûna 2011'an de li gundê Roboskê yê navçeya Qilabana Şirnexê piranî jê zarok bi giştî 34 gundî bi balafirên şer ên artêşa tirk hatin qetilkirin. Gundiyên ku li ser sînor ji başûrê Kurdistanê vedigeriyan û qaçaxgerî dikirin wê şevê hatin kuştin. Bi salan e hikûmeta AKP'ê kujeran diparêze û kesên ku hesabê komkujiyê dipirsin ceza dike.

### DI DÎROKÊ DE WEKÎ DEQEKE REŞ E

Malbatên Roboskê her hefte bi boneya edalet pêk bê û kujer bên darizandin 7 sal in her hefte çalakiyan li dar dixin. Lê heta niha daxwaza edaletê ya malbatan pêk nehatiye û der barê malbatan de doz tên vekirin. Parlamenterê HDP'ê yê Şirnexê yê berê Ferhat Encu ku li Girtîgeha Tîpa F ya Kandirayê tê girtin, nameyek şand û got ku Komkujiya Roboskê di dîroka mirovahiyê de deqeke reş e... *RÛPEL - 3*

**ÎHD: Bila kiryarên Roboskê bên darizandin...** *R 3*



## An azadî an koletî

Kêm netewe hene ku bi qasî kurdan ji bo azadiyê berdêl dabin. An em ê bi yekitî û hevgirtî bin, an jî berbelav û ji hev dûr bikevin û encama van jî tenê "azadî û koletî" ye. Her du rê jî li ber me vekirî ne. Hişyariya civakî jî şertekî bingehîn ê vê serkeftinê ye... *Nivîsa Kakşar Oremar / R.6*



## Piştî qeyûm bûn wargehên mêran

Li Kurdistanê piştî ku qeyûm tayînî şaredariyên DBP'ê hatin kirin û şûnde ji bo ku destkeftiyên jinan xesp bikin çi ji destê qeyûman hat kirin. Qeyûmên ku bi destê AKP'ê ve şaredarî dagir kirin gelek saziyên jinan girtin û xebatên jinan sekinandin... *RÛPEL - 2*

## Trump ji nişka ve berê xwe da Iraqê

Serokê Amerîkayê Donald Trump û hevjîna xwe Melania Tump duh serdana leşkerên xwe yên li bargeha hawayî ya Eyn Esed a li parêzgeha Enbarê ya rojavayê Iraqê kir. Bi leşkerên vê derê re hevdîtin kir. Trump tenê sê saetan li Iraqê ma... *RÛPEL - 4*

## Rêyên gelek gundan hatin girtin



Li Kurdistanê ji ber berfê rêyên gelek gundan hatin girtin. Ev çend roj in li Dêrsimê berfeke zêde dibare. Ji ber berfa zêde li Dêrsimê herî kêm rêya 222 gundan ji çûn û hatinê hat girtin. Li navçeyên Pulur, Pilemuriye, Qisle û Xozatê jî li cihên bilind berf heta metreyekê jî bariyaye. Ji ber berfê rêya bejahiyê ya di navbera Pilemuriye û Erzînganê de jî dem bi dem tê girtin.



## Di wayî YJA STARÎ de ameyî têhet

Doza azadîye ya ke 40 serrî xo dima verdaye. Wirdî wayê yewbînan eynî mewzîyan de hemverê dişmenî de şer kenê. Gerîlaya YJA STARÎ Dîrok Cûdîye qala tewrbîyayîşê xo û ya waya xo kerde û va: "Ganî hemverê hêrişan de topyekûn tewrbîyayîşî bibî."... *RÛPEL - 5*



## Jinên Şêxmeqsûdê kooperatîfeke nû vekir

**HELEB -** Jinên taxa Şêxmeqsûdê bi rêya projeyan di pêşxistina aboriya taxê, bilindkirina asta aboriya jinan û peydakirina derfetên kar ji jinan re roleke girîng dilîzin. Jinên taxê bi hevkariya Kongerya Starê gelek proje kirin meriyetê û ji vana ya herî girîng jî dikana madeyên paqijiyê û amûrên malan e. Proje di destpêka meha mijdarê de ji aliyê Komîteya Aborî ya girêdayî navenda Komîna Şehîd Gulê Selmo bi lêçûneke 300 hezar lîreyên Sûriyeyê ket meriyetê. Li gorî berpirsên kooperetîfê, qezenca projeyê di 6 mehên destpêkê de ji bo kirîna kelûpelan û ji bo berfirehkirina projeyê dê werin bikaranîn û piştre bi awayekî wekhev dê li jinan were belavkirin.

# Qeyûman şaredarî kirin wargehên mêran

Hevseroka HDP'a Colemêrgê Zeynep Kaya têkîldarî polîtikayên qeyûman nirxandin kir û destnîşan kir ku qeyûman destpêkê êrîşî destkeftiyên jinan kirine û şaredarî kirine wargehên mêran



Li Kurdistanê piştî ku qeyûm tayînî şaredariyên DBP'ê hatin kirin û şûnde ji bo ku destkeftiyên jinan xesp bikin çi ji destê qeyûman hat kirin. Di çarçoveya vê desteserkirinê de ji meclisên şaredariyê heta girtina saziyan jinan gelek xebat û proje ji aliyê qeyûm ve hatin sekinandin.

Der barê polîtikayên qeyûm de ji Meclisa Şaredariyê ya Colemêrgê Zeynep Kaya ku di heman demê de hevseroka HDP'ê ya bajêr e, nirxandin kir.

Kaya anî ziman ku di dîroka cîhanê de yekem car bi HDP'ê re pergala hevserokatiyê hat avakirin û ji aliyê civakê ve bi xweşbînî hatiye pêşwazîkirin û da zanîn ku ji aliyê walîtiya Colemêrgê ve pergala hevserokatiyê wekî sûc hat dîtin û wiha domand: "Beriya ku qeyûm tayînî şaredariya Colemêrgê bê kirin ez di meclisa şaredariyê de bûm. Ji bo ku pergala hevserokatiyê bê qebûlkirin, me li gel hemû endamên meclisan civîn pêk anî. Di dawiya meclisê de dengê zêde ji erêkirina pergala hevserokatiyê re hat bikaranîn û pergala hevserokatiyê hat pijirandin. Piştre ev biryar ji walîtiyê re hat şandin. Piştî demekê walîtî name şand û got ku hevserokatî ne fermî ye û ew ê vê qebûl nekin, ger li dijî vê biryara walîtiyê pergala hevserokatiyê bê meşandin dê dozê vekin. Ew biryara ku ji aliyê meclisê ve hatiye qebûlkirin walitiyê wekî sûc dît. Bi vê biryarê dubare nîşanî me dan ku tehemmûlî jinan û têkoşîna jinan nakin. Ev biryar biryara îktîdara desthilatdar û ya baviksalarî ye."

**Kiryarên qeyûman**

Kaya got ku yekem kiryara qeyûm êrîşa li dijî destkeftiyên jinan bûye û diyar kir ku niha di şaredariyê de tenê mêr hene û tenê gotinên wan derbas dibin.

Her wiha Kaya di dawiya axaftina xwe de bang li jinan kir ku di xebatên hilbijartina herêmî de cih bigirin û di roja hilbijartinê de jî destkeftiyên xwe ji qeyûman bistînin. *COLEMÊRG*

## Girtî vîna berxwedanê nîşan didin



Rojnameger Kîbriye Evren a li Girtîgeha Tîpa E ya Amedê girtiye û di 16'ê kanûnê de dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û dorneveger kir, di nameya şandî de pêvajoya tê jiyîn nirxand.

Evren di nameya xwe de diyar kir ku di sedsala 21'emîn de feraseta netewedewletê bi hemû rêbazên serdestiyê ji bo domandina hebûna xwe her cureyên tundiyê bi kar tîne û wiha got: "Desthilatdarî ji bo xwe saxlem bike her cureya tundiyê bi kar tîne lê ev di zemîna rizyayî de teqez mehkûmê têkçûnê ye. Ji ber dizanin ku em kesên di ferqa vê de ne, me digirin û dikin girtîgehan. Ez wek jinek rojnameger li vir im. Peywira rojnameger ne afirandina derewan e, ya rast ji derewan xilaskirin e. Di vê rêya aloz de rîsk girtine û rastiyan bi civak û cîhanê re parve kirine. Ez wek rojnamegerekê ji bo pîşeya xwe bi van rêbazan pêk bînim, îro girtî me."

**Tecrîd sûcê mirovahiyê ye**

Di berdewamê de Evren bal kişand ser çalakiyên grevên birçîbûnê ku ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hatine destpêkirin û ev nirxandin kir: "Li girtîgeha ez niha lê me Leyla Guven bi dengekî bilind got tecrîd sûcê mirovahiyê ye. Desthilatdariyên ku vî sûcî dikin jî dizanin ev sûc e. Taybetmendiya me ev e ku em di esasa nirx û rêbazên ku diparêzin de li dijî vî sûcî îradeya berxwedanê nîşan didin."

**'Bibîranîn berxwedan e'**

Evren da zanîn ku şikandina tecrîda li ser Ocalan şikandina tecrîda li ser milyonan e û nameya xwe wiha bi dawî kir: "Daxwaza me ya sereke rakirina tecrîda li ser birêz Ocalan e. Em hemû kesan vedixwînin ku bar û berxwedana jinên kurd ên bedena xwe dane ber mirinê, hildin. Bêdengî û temaşekirina li dijî mirinê, bêguman wek tecrîdê sûcê mirovahiyê ye. Em bi gotina Gramsci ya 'bibîranîn berxwedan e' biryarbûna berxwedana xwe ya mafdar dubare dikin. Em bi hêviya ku sala nû bibe sala berxwedanê, bi berxwedêrên grevên birçîbûnê yên bêdem û dorneveger piştevaniya jinê xurt dikin û sala nû ya berxwedanê pêşwazî dikin. Em ji niha de sala nû ya berxwedanê pîroz dikin." *AMED*

## 'Em ê bi yek dengî li ber xwe bidin'

Jinên kantona Hesekê yên ku tev li çalakiya konê çalakiya mertalên zindî ya li ser sînorê Sêrêkaniyê bûn, têkildarî çalakiyên xwe axivîn û diyar kirin ku dê heta dawiyê axa xwe li hemberî dagirkeriya dewleta tirk biparêzin.

Zekiya Mihemed a çalakger anî ziman ku ew ji Hesekê ji bo parastina axa xwe hatiye ser sînor û wiha got: "Em gelê Rojava bi hemû pêkhateyên xwe tu car qebûl nakin ku faşîstekî wekî Erdogan derbasî axa me bibe. Em ê bi hemû hêza xwe li hemberî wî bisekinin. Em tu carî natirsin û ger ew êrîş bikin em ê vir bikin tirba wan."

Her wiha dayika bi navê Hediya Mihemed jî ev tişt anî ziman: "Dewleta tirk çi dike bila bike ew ê nikaribe axa me dagir bike. Em ê bi dengekî hevpar li ber xwe bidin. Em ê wekî gelê li rojavayê Kurdistanê heta dawiyê xwe biparêzin û serî ji dijmin re netewînin. Ew bi tu êrîşan nikarin me bitirsînin, bila ew bitirsin." *SERÊKANIYÊ*




## Dê xebatên perwerde û birêxistinkirinê bidomin

Seroka Desteya Jinê ya Qamişloyê Roken Ehmed xebatên 2018'an nirxandin û diyar kir ku wan bi sîstem û xebatên nû salek derbas kiriye û dê sala nû de jî xebatên xwe bidomînin.

Ehmed anî ziman ku rêveberiya xweser di destpêka salê de pergaleke nû da destpêkirin, li navçe û bajarokan xwe bi rêxistin kir û wiha got: "Navçe, bajarok, kantona li ser asta herêmê hatin birêxstinkirin û sînorên rêveberiya wan hat diyarkirin. Di hilbjatinên pêk hatin de ji meclisan ji sedî 50 jin bûn, ji bo her komîteyekê 3 jin hatin hilbjartin. Ji pêkhateyên kurd, ereb, suryan hatin hilbijartin û ew jin bûn nûnerê herêma xwe. Her wiha li ser asta kantonê me komîteyên xwe ava kirin."



**Navendên şêwirmendiya derûnî**

Di axaftina xwe de Ehmed da zanîn ku li Qamişlo, Çelaxa, Til Temir û Hesekê bi giştî çar navendên wan ên şêwirmendiya derûnî hene û wiha domand: "Bi armanca piştgiriya derûnî 10 qadên perwerdeyê me vekirin, 89 jin hatin perwerdekirin, her wiha 88 semîner di mijarên derûniyê de hat dayîn. Ji jinên di zindanan de jî perwerde hat dayîn."

**Perwerdeya jin û zarokan**

Her wiha Ehmed destnîşan kir ku ew tu cudahî naxin nav neteweyan û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "25 perwerde di aliyê zagonên jin û xweseriya wê de hat dayîn. Her wiha ji bo 62 jinên ereb ji bajarokê Erîşa, Hol, Şedadê Komîteya Perwerdeyê ya Kongreya Star perwerde dan. Akademiyek bi navê Şehîd Nalîn Mûş hat vekirin. Navendên me yên wekî parastina jinê û parastina zarokan hene. Îsal 45 zarok hebûn û 14 zarokên ji Efrînê jî lê zêde bûn. 38 zarok jî piştî piştgiriya derûnî dîsa teslîmî malbatên xwe hatin kirin. Her wiha navendek ji bo jinên temenmezin hat vekirin. Jinên temenmezin ên kesî wan tune ne li vir tên parastin. Her wiha ji bo azadiya Rêber Apo, Efrînê me hemleyên cuda dan destpêkirin û piştgirî dan. Gelek xebatên bi Rêxistina Sara û bi Meclisa Edaleta Jinê re hatin kirin." *QAMIŞLO*






## Yekemîn konferansa jinên Minbicê pêk hat

Li bajarê Minbicê bi dirûşma 'Jinên birêxistinkirî misogeriya Sûriyeyeke demokratîk in' yekemîn konferansa Meclisa Jinên Minbicê pêk hat. Konferans li hola civînan a Meclisa Zagonsaz pêk hat.

Di konferansê de bi navê Komîteya Jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Meha Elelî axivî û lidarxistina konferansê li hemû jinan pîroz kir û da zanîn ku konferans di encama keda jinên têkoşer û birêxistinkirî de hatiye lidarxistin.

**Nîşaneya ruhê berxwedanê**

Seroka Desteya Rêveber a Meclisa Sûriyeya Demokratîk Îlham Ehmed jî di konferansê de axivî. Ehmed diyar kir ku lidarxistina konferansê di vê pêvajoya hestiyar de pêngaveke girîng e, ji ber ku Minbic û hemû herêmên Bakurê Sûriyeyê di bin gefên dagirkeriya dewleta tirk de ne. Ev nîşaneya ruhê berxwedanê yê gelên bakurê Sûriyeyê û bi taybetî jî yê jinan e û wiha got: "Ev konferans dide nîşandan ku jinan di warê xwebirêxistinkirinê de gavên girîng avêtine."

Di axaftina xwe de Ehmed bal kişand ser gefên dewleta tirk û anî ziman ku jin pêşeng in û bi hêz û vîna jinan dê hemû êrîşên li dijî gel têk biçin.

**Li dijî êrîşan yekdest in**

Her wiha di konferansê de li ser navê pêkhateyan axaftin hatin kirin. Di civînê de Riweyda Silêman a çerkez, Hêvîn Mihemed a kurd, Şîraz Qoco ya ereb û Kefa Hesen a trikmen axivîn û diyar kirin ku hemû gelên herêmê li dijî gefên Tirkiyeyê yekdest in û ji bo ewlehî û aramiya herêmê banga yekitiyê kirin. *MINBIC*



## Berpirsê yekem hikûmet e

Di 16'yê kanûnê de li navçeya Çemçemal a Silêmaniyê jina bi navê Sêwan Qadir û sê zarokên xwe bi awayekî bi guman şewitîn û jiyana xwe ji dest dan. Civakê gelek bertek nîşanê vê bûyerê dan. Rêxistina Jinên Azad ên Kurdistanê (RJAK) jî li ser mijarê daxuyaniyek nivîskî da û diyar kir ku berpirsê yekem hikûmet e.

RJAK'ê anî ziman ku di nav civakê de kuştin û şewitandina jinan bûye diyardeyeke metirsîdar û wiha got: "Bêhna jinan ji wan standine. Roj nîne ku agahiya kuştina jinan nebihîzin.Van bûyeran û dengan civak serûbin kiriye û hikûmet û perlamento li hemberî vê ker in."

**Sedem nebûna zagonan e**

Di daxuyaniyê de RJAK'ê destnîşan kir ku sedemên bûyera nebûna zagon û hebûna hizban a li pişta bûyeran dibînin û wiha domand: "Bi rêya fêzefilmên dagirkerên Kurdistanê, bi taybetî dewleta tirk ê civaka me bi awayekî berevajî perwerde dikin. Êdî bi rêya rêzefilmên tirk re çanda civaka me xera kirine. Gihîştiye wê astê ku êdî ferdên malbatê hevdu bikujin û bişewitînin."

Her wiha RJAK'ê ragihand ku heta kujerên Sêwan Qadir û zarokên wê neyên cezakirin dê têbikoşin. *SILÊMANÎ*

www.arsivakurd.org

# Komkujiya Roboskê nayê jibîrkirin

Li ser Komkujiya Roboskê 7 sal derbas bûn lê hê jî kujer nehatine darizandin. Der barê salvegera komkujiyê de parlamenterê HDP'ê yê berê yê girtî Ferhat Encu nameyek şand û diyar kir ku Komkujiya Roboskê weke deqeke reş derbasî dîroka mirovahiyê bû

Di 28'ê Kanûna 2011'an li gundê Roboskê yê bi ser navçeya Qilebana Şirnexê ve di encama bombebarana balafirên şer ên artêşa tirk de 34 welatî hatin qetilkirin. Lê tevî ku di ser qetlîamê re 7 sal derbas bûn jî hêj berpirs nehatine darizandin. Malbatên Roboskê ji ji 350 hefteyan zêdetirin in ku ji bo edalet pêk bê her pencşem çalakî pêk tînin.

Parlamenterê HDP'ê yê Şirnexê yê berê Ferhat Encu ku li Girtîgeha Tîpa F ya Kandirayê tê girtin, bi boneya 7'emîn salvegera Komkujiya Roboskê nameyek şand. Di nameya xwe de Encu Komkujiya Roboskê weke deqeke reş a di dîroka mirovahiyê de bi nav kir.



Di nameyê de Ferhat Encu diyar kir li gel ku ev qas sal jî di ser komkujiyê re derbas bûn jî, der barê komkujiyê de lêpirsînek jî nehatiye vekirin û wiha domand: "Berevajiyê vê, malbatên ku têkoşîna edaletê didin, tên darizandin. Dîrok dê vê bêhiqûqiyê ji bîr neke. Dê ji bîr neke û her wiha zû an jî dereng dê hesabê vê bêwijdaniyê jî bipirse."

Encu destnîşan kir ku ew berpirsyarên komkujiyê nas dikin û dizanin û ev tişt parve kirin: "Em tenê ji hejariya xwe nehatin kuştin, her wiha ji ber nasnameya xwe û ji ber xwemaliya xwe hatin kuştin û mixabin hê jî ev komkujî didome. Mirov nikare bi tang û topan, bi F-16'an ser heqîqetê bigire. Ji bo ku careke din em êşeke wiha nekişînin, divê em vîna têkoşînê, vîna xwe nîşan bidin. Divê em axa mirî ya ku ev 3 sal in me avêtiye ser xwe ji ser xwe bavêjin. Bêhtir, divê em heqîqetê, dadê vebêjin." Her wiha Encu diyar kir ku li dijî vê hişmendiya genî têkoşîn berpirsyariyeke wijdanî ye û bang li hemû mirovên xwedî wijdan û parêzerên heqiyê û hiqûqnasan kir ku bi gelê Roboskê re bin. *AMED*

## Tenê rêyek heye ew jî berxwedan e



Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû der barê salvegera Komkujiya Roboskê de axivî.

Karasû diyar kir ku komkujî bi zanebûn hatiye kirin û rayedarên tirk jî li vê yekê mikur hatine û wiha got: "Bi xwe dibêjin, qaşo 'di nav de PKK'yiyek hebû!' yanî ji bo kuştina PKK'yiyekî dikarin 34 zarokan jî bikujin, dikarin 34 hezar kesî jî bikujin. Ev yek mikurhatina li sûcê xwe ye."

Di axaftina xwe de Karasû diyar kir ku komkujî encama polîtîkaya şer a rejîma Erdogan e û got ku fermana komkujiyê ji aliyê Erdogan ve hatiye dayîn, ji ber fermandarê qereqolê nikare biryara kuştina ewqas mirovan bide.

Her wiha Mustafa Karasû destnîşan kir ku divê êdî helwesteke zelal li dijî desthilatdariya AKP'ê bê nîşandan û ragihand ku ger kurd naxwazin bên qirkirin, naxwazin ji holê werin rakirin tenê rêyek li ber wan heye; ew jî berxwedan e û got ji bilî berxwedanê tu derfeteke xwe nîne ku pê hebûna xwe biparêzin. *BEHDÎNAN*

## 'Failan derxin holê'

Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) û Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TÎHV) ên Amedê, bi boneya salvegera 7'emîn a Komkujiya Roboskê, li avahiya ÎHD'ê civîna çapemeniyê pêk anî. Endamê Komîsyona Windayan a ÎHD'ê parêzer Hasan Yalçin di civînê de daxuyanî da û wiha axivî: "Di Komkujiya Roboskê de 19 jê zarok 34 sivîl hatin kuştin. Divê ji failên komkujiyê hesap bên pirsîn.




Heqîqet tu carî bi kiryarên erkên siyasî û darazê nayê veşartin."

Yalçin got ku malbatên kesên di komkujiyê hatin qetilkirin piştî hemû rêyên hiqûqî yên navxweyî bi dawî bûn serî li Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê (DMME) dan û got ku DMME'ê di biryara xwe ya neyînî de êşa malbatê zêdetir kirine.

Her wiha Yalçin ji bo heqîqeta Komkujiya Roboskê derxin holê bang li desthilatdariya siyasî û dewletê kirin ku berpirsyariya xwe bi cîh bînin. *AMED*

## Dê girtiyên nû bikevin çalakiyê

Hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven di 7'ê mijdarê de ji bo rakirina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger kir û ev 51 roj in di grevê de ye. Bi heman boneyê girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê jî di 27'ê mijdarê roja damezirandina PKK'ê li 117 girtîgehan bi tevlêbûna zêdetirî 600 girtiyan, dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger ku 10 rojan carekê bi nobedarî didome, kir. Di 16'ê kanûnê de bi tevlêbûna 30 girtiyên ji heman dozê li 5 girtîgehên bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger kiribû.

Çalakiyên greva birçîbûnê yên bêdem û bêdorveger roj bi roj li girtîgehan berfireh dibin. Li Girtîgeha Tîpa F ya Kirikkaleyê ku 12 girtiyên ji bo rakirina tecrîdê çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger dabûn dest pê kirin, bi koma sêyemîn ve di roja 29'an de didome. Girtiyan da zanîn ku dê îro dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger bikin û gotin ku ew di çalakiya xwe de bi biryar in û banga hestiyariyê kirin.

Her wiha girtiyên di Girtîgeha Tîpa M ya Êlihê jî bi rêya parêzerên Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) ragihandin ger ku daxwazên wan neyên qebûlkirin dê dest bi çalakiya greva birîbûnê ya bêdem û bêdorveger bikin. *KIRIKKALE - ÊLIH*



## 'Beriya dereng bimîne gav biavêjin'

Baroya Wanê, Odeya Tabîban a Wan û Colemêrgê, Vakfa Mafên Mirovan (TÎHV), Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD), Platforma Hiqûqnasên Azadîparêz, (OHP), SES, Nûnerên KESK'ê, Komeleya Piştevaniya Malbatên Girtiyan (TUHAY-DER) bi armanca balê bikişînin ser pisgirêkên girtîgehan, li Baroya Wanê daxuyaniyek hevpar dan. Li ser navê saziyan Savaş Avci axivî û xwest mafê girtiyan bê parastin û daxwazên girtiyan li ber çavan bê girtin. Avci anî ziman ku girtî rastî binpêkêkirinên li dijî rûmeta mirovan tên û xwest mafên wan ên bingehîn bên parastin.

Her wiha Avci bal kişand ser çalakiya girtiyên bi navê Kadir Karabak û Esat Nacî Yildirin ku ev 103 roj in li Girtîgeha Tîpa F ya Wanê ketine rojiya mirinê û xwest Wezareta Dadê û Komîsyona Mafên Mirovan a Meclisê daxwazên wan li ber çavan bigirin. *WAN*

## Kurdistanî heta encamgirtinê bi biryar in

Çalakiyên greva birçîbûnê yên ku ji bo şikandina tecrîda li ser Ocalan ji aliyê kurd û kurdistaniyan ve hatine destpêkirin didomin.

Çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorvegeer a li bajarê Strasbourgê di 17'ê kanûnê de ji aliyê 15 kurdistaniyan ve hatiye destpêkirin di roja 12'yemîn de didome.

Ji roja destpêkirina çalakiya li Navenda Civaka Demokratîk a Kurd a li Strasbourgê vir ve bi sedan kes rojane serdana çalakiyê dikin. Hevserokê Kongreya Civaka Demokratîk a Kurdên Ewropayê (KCDK-E) Yuksel Koç ê tev li çalakiyê bûye, anî ziman ku biryardar in heta tecrîda li ser Ocalan bişkînin dê çalakiya xwe bidomînin û got ku dê bi vîneke bi hêz ser kevin.

Çalakiya ku bi heman armancê ji aliyê Nûnertiya HDP'ê ya Hewlêrê hatiye destpêkirin jî ket roja 38'an. Çalakgeran aşkera kirin ku heta tecrîd rabe dê çalakiya xwe bidomînin û bang li Neteweyên Yekbûyî (NY) kirin ku li dijî tecrîdê bêdeng nemînin. Ji aliyê din ve endamê Mekteba Peywendiyên Giştî ya YNK'ê Azad Colla çû serdana çalakvanên Hewlêrê û ji bo azadiya Ocalan piştgiriya partiya xwe ragihand.

Her wiha çalakiya greva birçîbûnê ya Komeleya Karkerên Mezopotamya ya Silêmaniyeyê di roja 14'an de ji aliyê endamên KODAR û KJAR'ê ve hat dewr girtin.

Bi heman armancî çalakiya ku ji aliyê welatiyên Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) ve hatiye destpêkirn jî di roja 13'an de didome.



**Ciwanên Rojhilat bang kirin**

Xebatkarên Şaredariya Şengalê jî piştgirî dan çalakiya grevên birçîbûnê û çalakvanan silav kirin.

Her wiha Komîteya Ciwanên Welatparêz ya şehîd Akîf a li bajarê Bokan ya Rojhilatê Kurdistanê bi daxuyaniyek nivîskî piştgiriya xwe ji bo çalakiyên greva birçîbûnê anî ziman û bang li ciwanên Rojhilat kirin ji bo paşerojek azad û demokratîk têkoşîna xwe bilind bikin. *AMED*

ŞÎROVE

Ahmet AKTAŞ
saktas25@hotmail.com



## Sala 2018'an

Wexta behsa sala 2018'yan were kirin, gelo bi giranî kîjan mijar dê were bîra mirovan?

Hema di serî de mijar û bûyera herî girîng a di destpêka salê de, di rojên Newrozê de pêk hat; êrîşa dagirkeriyê ya dewleta tirk a li dijî Efrînê dê were bîra mirovan.

Di dawiya salê de jî, biryara Trump a vekişîna ji bakur-rojhilatê Sûriyeyê (Rojava) dê were bîra mirovan.

Bêguman di nav vê salê de, hem li Kurdistanê û hem li cîhanê gelek mijar û bûyerên girîng ên cuda yên din jî hene. Helbet em ê di vê nivîsê de karibin bi tenê li ser hinek bûyerên ji nêz ve têkildarî herêma me û welatê me ne, bi kurtayî şîroveyê bikin. Mînak; senoryoya cînayeta Cemal Kaşikçî û hwd.

Niha jî çalakiyên herî girîng, aktuel û berbiçav ên pirreng ên ji bo rabûna tecrîdê li ser wî û azadbûna wî ya Rêber Apo grevên birçîbûnê di rojevê de ne. Wisa diyar e van çalakiyan derbasî sala 2019'an jî dibin.

Dagirkirina Efrînê gelek giran hat bi gelê me. Her wiha bûyera herî girîng a vê salê bû. Ji bo şoreşa Rojava tije peyam û ders in. Berî her tiştî, weke ku nav hate lê danîn "Berxwedana Serdemê" hat kirin li vê xaka me ya pîroz û zeytûnî. 58 rojan, bi giştî li hemberî hemû teknolojiya modern a kevneperestiya dewletên cîhanî, bi taybetî jî li dijî celladên Recep Erdoganê erîşkar û xwînrij û faşîst, ku cendermetiya hemû kevneperestiya cîhanê dikir û niha jî dike, gelê me bi pêşengên xwe YPG û YPJ'ê re, qehremaniyek destanî û dîrokî raxist ber çavan.

Niha jî ew berxwedan her dewam dike. Bêguman di vê qonaxa nû ya duduyan de, ji kêmayî û qusûrên xwe jî ders hatin derxistin, ew ruhê berxwedêr niha hîn bi zanebûn û hostayîtir hate pijandin û li ser vê perwerdeyê têkoşîn tê meşandin.

Ji ber ku ji bûyera Efrînê ders hatin girtin, êdî biryara Trump a ji bo vekişandina leşkerê xwe ji bakur û rojhilatê Sûriyeyê, zêde bandora nebaş li ser gelê me nekir. Hîn jî bîra kesî neçûye, ew biryar û kiryara Rûsyayê ya ji bo Efrînê.

Bêguman şoreşa Rojava, bi giştî li ser gelê me û bi taybetî jî li ser gelê me yê Efrînê bandora xwe ya erênî, aliyê xwe yê baş zêde bi bandor bûbû. Vê bandora pozîtîf hinek xemsarî jî bi xwe re anîbû. Helbet vêya jî hinek polîtîkayê dewletan dabû jibîrkirin û ji felsefeya Rêberê xwe ya baweriya temam a bi xwe hinek dûr xistibû û sistayî peyda kiribû.

Lê ez bawer dikim ku niha hem tevger û hem gelê me bi giştî ji van xemsariyên xwe baş ders derxistine. Her wiha dost û dijminan baştir ji hev derdixin. Li ser felsefeya Rêberê xwe baştir xwe perwerde û xurtir kirine. Lewma ji biryara Trump, weke ya Putîn neketin bin bandoreke negatîf. Zû bi ser hişê xwe ve hat û êdî baweriya bingehîn ne bi filan û bêvan dewletê tîne, belê baweriya bi xwe ji xwe re dike bingeh.

Êdî li ser vê çerçova bingehîn, dikare dîplomasiya xwe jî, lobiya xwe jî pêk bîne û bê tirs, ji xwe bawer, dikare têkiliyan li ser vê hişmendiyê bi her hêzê û dewletê jî re deyne.

Her wiha wisa tê xuyakirin, berevajiyê ew biryara Trump dikare bi aliyê pozîtîf ve were veguhestin. Ger wisa were dîtin û bikaranîn, rêyên dîplomasiyê ji berê firehtir dibin. Ew dîplomasiya kevn a bi yek-du dewletan an hêzan bi tenê re, niha dikare were zêdetir kirin.

Jixwe yê ku niha di warê siyasî û diplomasî de tengav bûne û rê li ber şaş bûne ew in ên ku xwe serkeftî didîtin; Trump, Putîn, Recep, Rûhanî û hwd. Bêbawerî û nakokiyên navbera wan niha zêdetir bûne.

Helbet divê em jî ji berê xurtir xwe bi rêxistin bikin û li dora Rêberê xwe kom bibin. Ew çalakiya li ser vê bingehê tê meşandin û Leyla Guven pêşengiyê jê re dike, divê her kes ji aliyê xwe ve lê xwedî derkeve û xurtir bike.

Li ser vê bingehê, bi hêviya deskeftiyên nû sala 2019'an pîroz be!

www.arsivakurdi.org



## Li Atînayê bombe teqiya: 2 kes birîndar bûn

**ATÎNA** - Li paytexta Yewnanistan Atînayê, bombeyeke bi destan hatiye çêkirin li ber dêrekê teqiya. Di encamê de 2 kes birîndar bûn. Piştî ku li ser pakêteke bi guman gilî hate kirin, polîs çûn cihê bûyerê û di wê kêliyê de teqîn çêbû. Ji ber teqînê, parêzvanekî dêrê û polîsek bi sivikî birîndar bûn. Heta niha kes an jî rêxistinekê berpirsyariya êrîşê li xwe negirtiye. Ev teqîn di nav gel de bû sedema tirsê. Tê payîn ku di sersala 2019'yan de çeteyên DAIŞ'ê dixwaze li welatên Avropayê teqînan pêk bînin. Ji bo vê yekê gel hat hişyarkirin ku di şeva sersalê de bi baldarî tevbigerin.

# Trump çima ji nişka ve çû Iraqê?

Serokê Amerîkayê Donald Trump bêyî ku hevdîtinê li gel rayedarên Iraqê bike, bi awayekî ji nişka ve serdana Iraqê kir û bi leşkerên Amerîkayê re hevdîtin kir. Ev serdana Trump a ji nişka ve rastî berketên hêzên siyasî yên Iraqê hat. Rayedarên iraqî banga kir ku parlamentoya Iraqê bicive

Serokê Amerîkayê Donald Trump û hevjîna xwe Melania Trump duh serdana leşkerên xwe yên li bargeha hawayî ya Eyn Esed a li parêzgeha Enbarê ya rojavayê Iraqê kir. Li wir bi leşkerên Amerîkayê re hevdîtin pêk hat.

Serokê Amerîkayê Donald Trump tenê sê saetan li Iraqê ma. Di wê demê de bi tu rayedarên Iraqê re hevdîtin pêk neanî. Serokê Amerîkayê Donald Trump di axaftina xwe ya li baregehê de aşkera ku niyeta wan nîne ku leşkerên xwe ji Iraqê vekişînin û got ku ger operasyoneke leşkerî li Sûriyeyê pêk bînin, dikarin li baregehên Iraqê pêk bînin.

Qesra Spî ya Amerîka di daxuyaniyekê de sedema nebûna civîna serokê Amerîkayê Donald Trump û berpirsên Iraqê aşkera kir. Berdevkê Qesra Spî diyar kir ku Trump di serdana xwe ya Iraqê de li gel tu berpirseke Iraqê necîviya, ji ber ku ew berî demeke kurt ji serdanê hatin agahdarkirin û got ku ew ji ber ewlehiyê hevdîtin pêk nehatiye.

Berdevkê Qesra Spî aşkera kir ku Trump bi telefonê pêwendî bi serokwezîrê Iraqê Adil Ebdilmehdî re kiriye û ew vexwend Amerîka û Ebdilmehdî jî ew vexwandin qebûl kir. Ofîsa Serokwezîrê Iraqê bi daxuyaniyekê de aşkera kir ku rêveberiya Amerîka Bexda ji serdana Trump a ji bo pirozkirina hikûmeta nû ya Iraqê û serdana leşkerên Amerîka yên li Iraqê agadar kiriye û hikûmeta Iraqê pêşwazî li vê serdanê kir.

Di daxuyaniya Ofîsa Serokwezîrê Iraqê de wiha tê gotin; "Pêwîst bû pêşwaziyek fermî bihata kirin. Ew ê serokwezîrê Iraqê Adil Ebdulmehdî û serokê Amerîkayê Trump hevdîtin pêk bianiyana, lê ji ber nêrînên cuda yên li ser awayê hevdîtinê herduyan peywendiya telefonê pêk anî û pêşkeftin gotubêj kirin." Serokwezîrê Iraqê kêfxweşiya xwe ya ji bo serdana Trump nîşan daye û ew vexwendiye paytexta Iraq Bexdayê.



**Fikarên iraqiyan**

Serdana ji nişka ve ya Trump bêyî protokolên fermî û hevdîtinên bi rayedarên Iraqê re pêk hat. Ev yek rastî nerazîbûnên hêzên siyasî yên Iraqê hat. Serokê Koma Çaksazî û Binyadan a li Parlamentoya Iraqê Sebah Seîd daxwaz kir ku parlamentoya Iraqê bi awayekî awarte li ser mijarê bicive û got; "Piştî ku serokê Amerîkayê Trump rêz li serweriya xaka Iraqê negirt, bila parlamento bicive. Serdana Trump binpêkirina aşkera ya serweriya xaka Iraqê ye. Dîmenek wek ku Iraq wîlayeteke ji welatê Amerîkayê be derketiye holê. Divê parlamento civîneke awarte pêk bîne û tevgerên wiha rawestîne. Ev serdan ji derveyî pîvanên dîplomasiyê ne." Serokê Koma Çaksazî û Binyadan ya li Parlamentoya Iraqê Sebah Seîd daxwaz dike ku hikûmet vê serdanê red bike û bi lez NY'ê agadar bike û bang li sefîrê Amerîka yê li Bexda bike.Her wiha di torên civakî yên iraqiyan de li hemberî serdanê gelek nerazîbûn çêbûn. *BEXDA*



## Erebistana Siûdî bersiva Trump da

Li gorî ajansa CMBC a Amerîkayê, berpirsekî balyozxaneya Erebistana Siûdî ya Amerîkayê, ku nexwestiye navê xwe aşkera bike, bersiva daxuyaniyên serokê Amerîkayê Donald Trump da û got welatê wî tu soz nedaye ku ji bo jinûveavakirina Sûriyê pereyan terxan bike.

Çavkanî diyar kir ku Erebistana Siûdî ji bilî pakêta pereyan a meha tebaxê tu sozên din nedane. Di meha tebaxê de Washingtonê ragihand ku Siûdî dê ji bo aramiya herêmên Sûriyeyê yên ji DAIŞ`ê têne rizgarkirin 100 milyon dolar terxan bike.

Berpirsê Siûdî got welatê wî endameke çalak e di Hevpeymana Navneteweyî de ye û di mijara pêkanîna êrîşên esmanî de hêza duyemîn e, her wiha bi milyonan dolar ji bo alîkariya sivîlan terxan kiriye. Serokê Amerîkayê Donald Trump roja duşemê li ser Twîtterê gotibû "Erbistana Siûdî soz daye ku li şûna Amerîkayê pereyan ji bo jinûveavakirina Sûriyeyê terxan bike."

Mîrnişînên Ereb ên Yekbûyî (MEY), ku hevalbendê nêz ê Erebîstana Siûdî ye, wê sefaretxaneya xwe ya bilind a li paytexta Sûriye Şamê ev 7 sal in girtî ye.

Rayedarekî Wezareta Ragihandinê ya Sûriyeyê ji AFP'ê re axivî û got, "Li ser daxwaza Wezareta Karên Derve, Wezareta Ragihandinê ya Sûriyeyê bang li rojnamevanan kir ku tev li merasîma vekirina sefaretxaneya bilind a Mîrnişînên Ereb ên Yekbûyî ya li Şamê bibin." Hikûmeta Sûriyeyê roja 18'yê kanûnê bang li welatên Ereb kiribû ku sefaretxaneyên xwe yên bilind ên li Şamê ji nû ve vekin.

Li gorî hin îdîayan, Yekîtiya Ereb jî amadekariyan dike ku rejîma Sûriyeyê ji nû ve bixe bin sîwana xwe. Sala 2011'an li ser daxwaza serokê wê demê yê DYA'yê Barack Obama, Sûriye ji nav yekîtiyê hatibû derxistin. Sûriye yek ji endamên damezrîner ên Yekitiya Ereb bû. *ŞAM*

# Bîlançoya çalakiyên Êlekzeran giran dibe

Çalakiyên Êlekzeran ku 17'yê mijdarê li Fransayê dest pê kirin û ji ber betlaneyên Noel û Sersalê hinekî sekinîn, tê gotin ku bûne sedema zirareke bi milyaran euroyî.

Çalakiyên Êlekzeran bi nerazîbûna li dijî baca sotemeniyê dest pê kir lê veguherî çalakiyên parastina mafên desteserkirî yên mirovên xwedî hatineya kêm û navîn. Heta niha bi sedhezaran kes tev li çalakiyan bûne.

Xwepêşandan 6 hefteyan her roja şemiyê bi beşdariya bi sedhezaran kesan li gelemperiya Fransayê pêk hatin. Di xwepêşandanan de şer derket û li sedan bajar û bajarokan karên şîrketên bazirganiyê asteng bûn. Ji destpêka çalakiyan ve li sedan cihan Êlekzeran bi şev û roj nobed girtin. Maliyeta çalakiyên Êlekzeran li ser aboriya Fransayê jî zelal dibe. Li sedan bajar û bajarokan, geştiyarên xwe ji çalakiyan vedigirtin, tev li bazarên Noelê nebûn. Tê gotin ku vê yekê jî kar çîroyê kêm kiriye.

Li gorî Wezareta Aboriyê ya Fransayê, windahiya kargehan a ji ber çalakiyan herî kêm 2 milyar euro ye. Ev yek jî tê wê wateyê ku di çaryeka dawî ya salê de mezinbûna aboriyê wê herî kêm bi 0,1 pûanî kêm bibe.

Tê gotin, karsazan ji ber çalakiyan berê 43 hezar karkeran dane alîkariya bêkariyê. Li gorî agahiyan, dewlet wê ji bo xebatkarên ji ber sedemên aboriyê derbasî sîgortaya bêkariyê bûne, herî kêm 28 milyon euroyî bide. *PARÎS*



# Gelo DAIŞ'ê xwest êrîşî trenê bike?

Li ser xeta trenê ya banliyoyeke paytexta Almanya Berlînê pirsgirêkek derket. Polîsên ku li ser vê yekê lêkolîn kirin, belavok û ala DAIŞ'ê dîtin.

Beriya cejna Noelê, li gelek balafirgehên Almanyayê ji ber tirs û fikara êrîşa terorê tedbîrên tund ên ewlekariyê hatibûn girtin. Di serdegirtinên malan de jî yên der barê êrîşên gengazên terorê de 4 kes hatibûn destgîrkirin.

Di xeta trênê ya banliyoya navbera navçeyên Lîchtenberg û Kopenîck ên paytexta Almanya Berlînê pirsgirêkekê rû da. Tê gotin, pirsgirêka li xeta trenê ji ber hewldaneke êrîşa terorê rû daye. Hate ragihandin ku di encama lêkolîna polîsan de derket holê ku pirsgirêka rû da ji ber êrîşeke sabotajê bû.

**Îşaret bi DAIŞ'ê tê kirin**

Polîsan li herêma navbera stasyonên Karlshorst û Wûhlheîdeyê lêkolîn kirin û encamên destpêkê hatin aşkerekirin. Li gorî vê yekê, li ciheki nêzî xeta trênê aleke DAIŞ'ê û nêzî 60 belavokên bi îmzeya çeteyên DAIŞ'ê hatine dîtin. Ji polîsên Berlînê Mîchael Gesen diyar kir ku delîlên hatine bidestxistin nîşan didin ku DAIŞ'ê amadekariya êrîşekê kiriye. Lê belê DAIŞ'ê heta niha berpirsyariya pirsgirêka li xeta trênê negirtiye ser xwe.

Hate gotin, di belavokên bi îmzeya DAIŞ'ê de yên hatin dîtin, gef li welatên Ewropayê tê xwarin. Hate ragihandin ku di belavokê de ji Ewropayê tê xwestin ku dawî li êrîşên xwe yên li ser 'Dewleta Îslamî' bînin, nexwe wê bibin hedefa êrîşên wan. *BERLÎN*



## Îsraîl dê jîngehên nû ava bike

Hikûmeta Îsraîlê, li gel helwestên tund jî, li ser xaka Filistînê wê bi hezaran jîngehên din ava bike. Tevgera 'Aniha Aştî' ya ku di navbeyna Îsraîl û Filistînê de aştiyê dixwaze, bi daxuyaniyekê diyar kir, wezareta berevaniyê destûr daye ku li ser xaka Filistînê bi kêmanî 2 hezar jîngehên nû yên cihûyan werin avakirin.

Tevgera Aniha Aştî ragihand, sêşem û çarşemê wezaretê destûra bi kêmanî destûra avakirina hezar û 159 jîngehên nû yên cihûyan daye. Tevgera Aniha Aştî di daxuyaniya xwe de diyar dike ev plana jîgehên nû ku tê xwestin li Şerîaya Rojava were avakirin ziyanê digihîne aştiya bi gelê Filistînê re. *TELAVÎV*



Kirmanckî

28 Kanûne 2018 Îne



## Varayîş vera nêeşkenê lazut û pemboyan biçinî

**MÊRDÎN -** Mêrdîn de bî heyteyêk varayîşêko zêd esto. Cok ra çinitişê lazut û pemboyan erê kewt. Taybet zî Qoser û Dêrikî de varanêko zêde vareno û cok ra citkarî nêeşkenê erdê xo biçinî. Na rewşe tesîrê xo daye qelîteyê pembo û lazutî ser û bî sebebê kêmbiyayîşê berardişî. Citkaran ra Faruk Erol, Haci Murat Orman û Bayram Beslerî qisey kerdî û vatî: "Êdî ma zî nêzanê se bikerî. Berardiş perîşan bî. Ma mecburê erjanî danî bazirganan. Emserr ma kewtî zirar. Heqê mazot, cereyan û gubre daxî nêvejîya."



# Di wayî YJA STARÎ de ameyî têhet

Doza azadîye ya ke 40 serrî xo dima verdaye. Wirdî wayê yewbînan eynî mewzîyan de hemverê dişmenî de şer kenî. Gerîlaya YJA STARÎ Dîrok Cûdîye qala tewrbîyayîşê xo û ya waya xo kerde û va: "Ganî hemverê hêrişan de topyekûn tewrbîyayîşî bibî. Rayîrê azadîye Kurdistan ra ravêreno."



Bahoz AMED / Ronî DEŞTELANÊ / BEHDÎNAN - ANF

Koyanê Kurdistanî de wextê dergî ra dima reywanîya ma reyna dest pêkerd. Nê rojanê verînan ê zimistanî de xoza ya Kurdistanî ya biheybetî de ma rêçê qicanê qehremanan ê Kurdistanî teqîp kenî û vîrameyîşê înan goşdarî kenî. Gerîlaya YJA STARÎ Dîrok Cûdî ya ke serra 2015î de waya aye Mêrdîn ra û dima ra aye Qamişlo ra tewrê PKKyî bîya bale ancena keyeyê xo ke senî mabênê di leteyanê Kurdistanî de mendo ser.

Gerîlaya YJA STARÎ Dîrok Cûdî daye zanayene ke endamê eynî keyeyê ra tayî Qamişlo û tayî zî Nisêbîn de yê û wina va: "Xalanê mi serranê qican de waya mi berdê cayê xo. Sinorê ke Kurdistan de ameyî xezkerdene nêverdayêne ma yewbînan bivînê. Heman herre de cîyabîyayîş zaf dejin o."

**Waya mi nê sînorî nas nêkerde**

Cûdîye dewamê qiseykerdişê xo de va 'waya mi seba ke nê sinoran bênate ra wedarna serra 2015î de tewrê safanê PKKyî bîye û ez bi naye biya sereberz' û dewam kerde: "Mi waşt ke ez rayîrê aye de şêra û aye reyde bêra têhet. Ez tewrê safanê YPJyî bîya. Nizdîyê di serran Rojawan de menda. Serra 2017î de seba ke ez biresî viranê xo tewrê gerîlayî bîya."

**Hisêko bizehmet yeno qalkerdene**

Dîrok Cûdîya ke serrêko sey gerîlaya YJA STARÎ koyanê Kurdistanî de ya heman keyeyî ra pîya heman pêrodayîşan de ca girewtiş sey hîsêko cîya biname kena û vana ke sey mi tîya de xeylî embazê ke eynî keyeyî ra tewr bîyî estî. Hemverê dişmenî de bi waya xo pîya pêkewtene hîsêko zehmet o, çew nêeşkeno bîyaro ziwan.

**Ganî topyekûn tewrbîyayîş bibo**

Dîrok Cûdî qiseykerdişê xo yê peyênan de vist vîrî ke kurdî demêko zehmet ra ravêrene û wina qedînaye: "Hetêk ra serê Rayberîya ma de tecrîd yeno girankerdene, hetêk ra zî hemverê şarê ma de hêrişê giran benî. Şarê ma yeno qetilkerdene û koyê ma yenî vêşnayene. Demêko winasî de bêvengmediş nêbeno. Ganî hemverê hêrişan de topyekûn tewrbîyayîşî bibî. Rayîrê azadîye Kurdistan ra ravêreno."

## Keya tena wezîfe ra ame girewtiş!



Ame îdîakerdiş ke dewa Şemrexî ya Mêrdînî de di mamostayê cinî hetê keya H.T.yo ke bi nizdîbîyayîşê xo yê AKPyî yeno zanayene ra raştê tacîzo zayendî ameyî. Goreyê îfadeyê şahidan hedîse 12 rojî verê qewimîyayo û badê ke mamostayî keya H.T.yî gerre kerdî bi piştîya kesê AKPyijan hedîseyê tacîzî ameyo padayîş.

Şahidê hedîseyî dayî zanayene ke Walîtîya Mêrdînî û Qeymeqamî H.T.yî wezîfe ra girewtî û mamostayî zî hetê MEBî ra tayînê sewbîna mekteban bîyî. Şahidî sewbîna îdîa kerdî ke mamostayî badê zextan îfadeyê xo tepîya antî û mamostaya ke wextê tacîzî de ameya derbkerdiş rapor girewta û daya emnîyetî. Ma xo resna mamostayan û mamostayî dîyar kerdî ke ê nêeşkenê derheqê babete de malumat bidî û seba ke hema zî zext esto ê nêeşkenê qisey bikerî. *MÊRDÎN*

## Grevê vêşanîye roja xo ya 12. de yo

Bajarê Strasbourgî yê Fransa de grevê vêşanîye yo bêdembêagêrayîşo ke seba wedartişê tecrîdê serê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî û paştîdayîşê çalakîya grevê vêşanîye yê parlamentera HDPyî ya Colemêrgî Leyla Guvene hetê 'Însîyatîfê Ocalanî rê Azadî' ra amebi destpêkerdene kewt roja 12.

Doktor Fahrettin Gulşen derheqê rewşê çalakwanan de nê va: "Ma kontrol de tesbît kerd ke mabênê 3 û 6î de vîndkerdişê kîloyî esto, la hetî bînî ra çîyêko xirab çin o. La des rojan de hendê vîndkerdişê kîloyî normal nêyo. Ê ke çalakwanan zîyaret kenî ganî bidîqet bî. Ê ke nêweşê wa temas mekerî. Serra 2012î de zî Ewropa de grevê vêşanîye ame viraştene. Xora şarê ma na babete de wayîr tecrubeyî yo. Sey grevê 2012 na rey zî temasê ma bi Doktoranê Sinor Nasnêkerdeyan esto."




Seba tehtîlê Noelî dezgehê fermî yê bajarî qefilnayeyî. Cok ra pêdîyayîşê bi CPT, KE, PEyî nê rojan de nênî viraştene. *STRASBOURG*

## Ma do îradeya xo nîşan bidî

Hemwelatîyê bajarê Wanî seba weçînayîşê herêmî ke do 31ê Adara 2019î de pê bêro amade yî. Partîya Herêmê Demokratîkî (DBP) weçînayîşê herêmî yê 2014î de Wan de 14 şaredarîyan ra 12 heban girewte. Tena Şaredarîya Tuşbaye bi hezan reyan û Şaredarîya Gewaşî zî bi 7 reyan vindî kerde. La reyna zî qayûmî tayînê şaredarîyanê DBPyî ameyî kerdiş ûzafê hemşaredaran ameyî tewqîfkerdiş. Hemwelatîyî paweyê roja weçînayîşîyî ke cewabê polîtîkayanê qayûmî bidî.

Derheqê babete de hemwelatîyan ra Şahîn Orhan, Nîzamettîn Tosun, Heşîn Aslan, Saît Kuşçu, Nadîr Çakar û Hamît Emreyî qisey kerdî. Hemwelatîyî qiseykerdişê xo de reaksîyon nîşanê qayûman dayî û wina vatî: "Bajar de kesêk polîtîkayê qayûman ra razî nîyo. Ma do hemverê zext, teda û hêrişan de serkewte bibî û rayan bidî HDPyî. Ma do heme şaredarîyan tepîya bigêrî û 31ê Adare de îradeya xo nîşan bidî." *WAN*



## Seba lazimîyan kota ronîya



Endama Komeleya Piştîdayîşî ya Keyeyêhukmwer û Hepsîyan ya Marmara Sureyya Aydine Zindanê Tîpa Lyî yê Bakirkoyî de bi hepsîyanê ke seba wedarnayîşê tecrîdo girankerde ke serê Rayberê PKKyî Abdullah Ocalanî yeno meşnayene kewtî grevê vêşanîye pêvînayîş viraşte. Aydine arde ziwan ke hetê weşî de kotrolê çalakgeran nîno kerdiş.

Aydine wina va: "Hema zî nêewnîyayî tansîyonê hepsîyan. Hepsî nêwazenê şêrî rewîr û wazenê ke kontolê înan qawişanê înan de bêro kerdiş. 2 rojan de reyêk kulmêk şekir, 4-5 lîmon û tay sol danî înan. Sewbîna zindan de kesê ke grev de yî ro kota ameyo ronayîş. Hepsîyê nêweş zî estî. Seba mast, fêkî, awa fêkîyan û sewbîna çîyan kota ronîyayo. Seba wedarnayîşê tecrîdo zerre, ganî tecrîdo ke Rayberê PKKyî Abdullah Ocalanî yeno meşnayene peynî bibo." *STENBOL*

## Tewrê heywanan axur de cuyena

Husnîye Sarigula (60) ke dewa Havuzlu ya qezaya Pulurî de mezrika Karataşî de heywanan miqate kena, tewrê înan mîyanê xeylê zor û zehmetîyan de axur de cuyena û fek cuya xozayî ra vera nêdana.

Sarigula ke bi heywankarî debara keyeyê xo kena qiseykerdişê xo de wina va: "Ma 1994î de wextê veşênayîşê dewan de mecbur mendî ke dewa Havuzlu ya qezaya Pulurî ra koçê Stenbolî bikerî. Ma 6 serren Stenbol de mendî û 2000î de agêrayî Pulur. Seba ke tapoyê erdê ma çin bî, ma mezrika Karataşî de bi ca bîyî. Verê cû ma tewrê heywanan ameyêne Pulur û wisar de ma verê xo dayêne zozanan. La ma emserr cayêk temîn nêkerd û tewrê heywananê xo axurêko 3 odeyîn de pîya cuyenî. Ma muracatê qeymeqam û şaredarî kerde, la hetkarî nêdayî. Ez îdarekaran ra tena axur û keyeyêk wazena." *DÊRSIM*







SERADA VÎRÎ
Nesrîn NAVDAR
NesriNavdar@hotmail.com



## Eyro rocan ra Roboskî ya

Eyro rocan ra rocêka tarî ya, rocêka bi bêbextî, mixenetî û zilmî ra degrotî ya… Eyro rocan ra Roboskî ya ke tarîtîya aye de vewrî bi gune tûtan û ciwanikanê dayanê xo bîya sûr e. Eyro rocan ra hewara dayanê Roboskî, dayanê Kurdan û heme şarê Kurdî ya. Eyro Sûrbîyayîşê vewra Roboskî zerre ma veyşnena, helnena û kizirnena!

Wexta serrnameyan tarîxa 28'ê Kanûna 2011'î moştêne ra çimê dayanê Roboskî rayîrê tûtanê înan de bi. Tût û ciwanê Kurdan ke sirf semedo ke şaristanêke xo yê bînî de dayîş û girotiş kerdibi û ageyrayne keyanê xo hetê dagirkeranê ke sînor mîyanberê herdi şaristananê înan de dabi ro ra bi top û guleyanê xo yê ke ejdîyanê asnîn ra înan ser de varrnayne ameyî qetilkerdişî. Çimê dayanê înan rayîrê înan de la ne ey risayî dayanê xo ne zî veng û qîrîne înan…

Roco ke nê dagirkeran kone dewlete xo axa Kurdan ser de daçiknaya heta rocê Roboskî, şarê Kurdî zehf rayan rast ro qetlîamanê înan ameyê. Qetlîamê 33 guleyan zî ke 28'ê Temûze 1943 de Qelqelîya Wanî de Kurdan ser de pêk ame nê qetlîaman ra hebêke yo ke hetê eynî pergala ra 33 canê Kurdan bê sûc û bê guna ameyî qetilkerdişî! 28'ê Temûza 1943 ra heta 28'ê Kanûna 2011'ine hetê desthilatan ra teberê sîlehan de çi bedelnayîş virazya? Bi 33 guleyanê xo kiştişê Kurdan û bi 34 roketanê teyaran kiştişê Kurdan. Zihnîyetê na pergala ya hetê Kurdan ser her wext eynî yo; bi heme awayî kiştişê Kurdan. Serrî û se serrî bedelênê, zanistî û teknolojî bedelênê la zihnîyetê na pergala dagikere eynî maneno û zilmê înan ê Kurdan ser de zêdyeno.

Ti fekêke nêeşkeno êşê dayanê Roboskî bîyaro ziwan û ti qelemêke zî nêeşkena binûsna la semedê înan êşêke bîn zî goreyê sûcdaran ra têgeyrayîşê Hukmî yo. Semedo ke çend ewraqî nêkewtê dosya heqê serdayîşê ferdî Dadgeha Qanûnê Bingeyî de ame vinîkerdişî û Dadgeha Heqanê Merdiman a Ewropa (DHME) zî no sey sebebî moşt ra û pêvajo qedêna! Bi nê awayî Kurdî rayêke bîne bî şahid ke bi qasê dewletê dagirkeran dewletê Ewropa zî hiqûq û qanûnanê xo goreyê nehfanê xo ra fînenê dewre û goreyê xo ra zî dewre ra vecenê.

Winî eyseno ke na desthilatî wazena versûcanê qetlîamê Roboskî zî sey heme versûcanê qetlîamê ke heta nika şarê Kurdî ser de pêk ardê bê ceza verdo û heta wexta fîrset bivîno sûcdaran xelat bikero. Û ancî mexsedê na desthilatî no yo ke qetlîamê newînan ke Kurdan ser de viraştê vîrê şarê Kurdî ra bero, înan het ra kerdişanê xo bikero rewşêke normal û her ke zerra aye waşt qetlîamanê xo înan ser de bidomno.

Hewt serrî yo ma benê şahid ke na pergale senîn hewl dana ke serê qetlîamê Roboskî bigîro û şarî vîr ra bero. Û winî eyseno ke her roc, hefte û aşmê ke şinê Roboskî ma vîr ra yena berdişî. Halbikaw ma zî xo rê soz dabi ke 'eke ma nê qetlîamê Roboskî xo vîr ra bikerê wa qelbê ma ziwa bo'. La eyro rewşo ke ma tedeyê û awayo ke eyseno ma sozê xo ra dûrî konê. Lazim o ma bi hiqûqnasan û siyasetmedaranê xo ya heta her ferdêke şarê xo ma no doze ra fek verra nêdê û dima bigeyrê heta ke sûcdarî cezaya ke heq kenê bigîrê. Lazim o ma Robosk nêkerê xo vîr ra û nêdê vîrakerdişî. Ewro hewt serrîya Roboskî ya û çimê dayanê Roboskî hema zî nêameyê ziwakerdişî…

www.arsivakurdi.org

# An azadî an koletî û bindestî!

Kesên ku dema xwe ya bihurî ji bîr dikin û jê dersên îbret nastînin, mehkûmî dubarekirina wê ne. Li vir dîroka me ye ku tim ji bîra me diçe. Dersên ji şikest, ketin û rabûnê tune bûne an jî ketine kirasê bertek ê hizbatiyê ku birêvebirên wê xwedî nêrîneke teng û sînordar in.

Di nav me kurdan de ruhên têhnî û nêrînên birçî ji yên hemû neteweyên din yên cîhanê zêdetir in. Kêm netewe hene ku bi qasî kurdan ji bo azadiya xwe berdêl dabin. Bi sedan sal in derdê bindestî û bêdewletbûnê hê jî nehatiye dermankirin. Nizanim çima hekîm û doxterekî/ê nekariye dermanekê ji vê birîna xedar re peyda bike! Gelo ma di vê serdemê de jî melhemek ji bo kewandina vê êşa giran peyda nabe? Sedem çi ne ku 50 milyon kurd nikarin bibin xwedî hêlîneke xwe ya serbixwe? Gelo çima ew "yekitiya neteweyî" a ku hemû rêxistin, partî, siysetmedar, komele, civat û malbat li ser diaxivin, dinivîsin û şiroveyên felsefî dikin, çênebû û çênabe? Ma ji bo karekî wiha "gez û miqes" di destê kê de ne?



Kakşar
OREMAR

An em ê bi yekitî û hevgirtî bin, an jî berbelav û ji hev dûr bikevin û encama van jî tenê "Azadî û Koletî" ye. Her du rê jî li ber me vekirî ne. Hişyariya civakî jî şertekî bingehîn yê vê serkeftinê ye

Bi rastî carna li ser kar û kiryarên partîyên siyasî li Kurdistanê mirov dikeve dudilî, goman û nav sosreteke mezin ka çima nebûne û nabine yek? Heya kengî ***"derfetên zêrîn"*** bi avê de biçin û gel jî tenê bi hesreta salên bihûrî yên jiyana xwe bijî?

Van rojên giran êdî ***"pirsa kurd û Kurdistanê"*** hem di nav me bi xwe û hem jî li hemberî raya giştî ya cihanê bûye pirsgirêkek exlaqî. Rêxistinên hiqûqî, lîberalîzm û neolîberalîzm nikarin hema wiha hêsan li hemberî vê pirsê derbas bidin. Di asayîş û garantîkirina jiyana gelên cîhanê de kurd xwedî kedeke dîrokî ne ku wijdanên mirî jî nikarin vê rastiyê ji bîr bikin. Awayê dan û standina bi vê pirsgirêkê re dê bide xuyankirin ka wijdana raya giştî ya gelên cîhanê ye raketî bimîne an dê parêzvaniyê ji destkeftên wê yê çend salên bihurî bike? Di vê navê de bendewariya herî zêde ji Ewropa û Amerîka heye ku ger hêza kurd nebûya heta roja îro jî kuçe û kolanên welatên wan yê bi terora misilmanên selefî û DAIŞ'ên xwînrij re rû bi rû mabûna. Pîvana "mafparêzî û demokrasiya" ku Ewropa û Amerîka pirî caran li ser diaxivin, dibêjin û dinivîsin dê nasnameya xwe a rastîn di van çend mehên dahatî de li rojavayê Kurdistanê bide der.



**Rewşa îro û kurd**

***Rewşa îro ji kurdan re jî pirsên jêr radixe ber me:***

✓ Ev rêbaz rêyeke stratejîk e?

✓ Gelo dê di asteke neteweyî û civakî de xwedî bersiv be?

✓ An jî dê her kes bi awayê rêbaza xwe ya belav, bêxwedî, bêxem û xeyalî di kêleka wê de derbas bibe?

Bersiv çi dibe bila bibe, lê êdî qedereke man û nemanê bi vê rêyê re girêdayî ye.

***Li Rojava ji destpêkê heya roja îro aliyê kurd neçar man li ser sê stratejiyan ketin nav lêkolîn û nirxandina pîvanên wan:***

✓ Stratejiya welatên herêma Rojhilata Navîn ku bi tu awayî bi guherandinan re nebûne û nînin. Di nav de herî zêde welatên ku axa kurdan di nav sînorên wan de ye, xwedî rêbazeke wiha bûne ku Tirkiye serkêşiyê jê re dike.

✓ Stratejiya welatên rojavayî li Rojhilata Navîn.

✓ Stratejiya bizava siyasî a kurd ku daxwaza maf û diyarkirina qedera xwe dike.

Di rewşa hatî pêş a îro de kurd û partî-rêxistinên kurdan ji xeynî ***"parastina asayîşa xwe ya neteweyî"*** û destkeftiyên heyî, rêyeke din li ber xwe nabînin. Nextê wan destkeftiyên ku îro li ber çava ne ewqas giran e ku hindî bihayê ***"serxwebûna Kurdistanê"*** ye. Asayîşa neteweyî hemû guherandinên siyasî, civakî, çandî, teknîkî, aborî û leşkerî di çarçova xwe de bi cih dike. Hêz û awayê dan û standina bizaveke siyasî girêdayî mijarên jor in. Dîtina pêşerojê çiqas jî bi zehmet be jî, lê pêwîstiyek e ku ***"jiyan û qederê"*** dide diyarkirin.

Guherandinên ku di çend salên derbasbûyî de bi lez hatin û çûn, dagirkerên Kurdistanê xistin nav liv û çalakiyên cudatir in ji dehan salên berê. Li dijî bizava kurd û bi taybetî jî li rojavayê Kurdistanê çêbûna guherandin û afirandina hêzên nû tişteki dûr ji çaveraniyê nebû. Dihate payîn ku li dijî wan guherandinên bi lez ku aliyê kurd sûdeke mezin jê stand, liv û lebatên nû jî bêne holê.

Pejirandina vê rastiyê ku pêwîst e hêzeke siyasî tim bi nêrîneke berfireh a hemû alî li pêşeroja xwe binihêre û li gorî şertên demê xwe amade bike, belkî hinek ji me re zehmet be. Elbete agahî li ser rewşa pêşerojê carna ne pêkan in, lê qet nebe ji 4-5 salên berê û şûnde ger kurd xwedî "stratejiyeke hevgirtî" bûna, îro Kerkûk, Efrîn, Şengal û Xaneqîn dê dîsa di nav sinorên desthilatdariya kurdan de bûna. Dîsa jî hinek derfet li ber hêzên siyasî li Kurdistanê hene ku ger li gor guherandinên herêmê nebin yek û xwe pê re neguncîn in dê reaksiyonên berdewam û zêdetir li dijî hebûna kurdan xwe bidin kifşkirin. Ger ji van guherandinên rojane re bersivek tune be, dîsa demeke zêde dê derbas nebe ku hemû kes bi hesreteke bêdawî dîsa behsa "dîroka derbasbûyî û axînên bêsûd" bikin. Hingî ***"me wiha bikira, çima nekir û dê baş bûya…"*** ji tu derdekî re yê nebin derman.



Belkî pêngava dawiyê ya Amerîka vê rastiyê bi aliyên kurd dide xuyanîkirin ku gelê kurd nikare pirsgirêka xwe di nav sînoran de analîz û çareser bike. Heta li para ku di çavê dewleta navendî, Amerîka û piraniya welatên cîhanê jî xwedî meşrûiyet bû lê li pey referandumê em şahidê selimandina vê rastiyê ne. Li wê derê jî helwesta Amerîka li dijî kurdan bi aşkerahî rûçikê xwe yê sala 1975'an dubare kir.

Mînakek wiha pir bi başî ji me re da aşkerakirin ku aliyê kurd hêza berxwedana li hemberî faktorên herêmî û rûdanên neçaverankirî nîne. Nikarin ji derfetên têne pêş sûdê werbigirin, bi şerên baş re ji bo diyariya qedera xwe sûdê bistînin û hinek realîstir bin. Dema li hemberî rûdanên ji nişka ve çêdibin, amadebûn hebe û derfet baş û durist bêne bikaranîn hingî di nasnameya partî, dewlet an jî rêxistineke siyasî de şertên xebateke micid, dozeke şoreşer û nêrîneke objektîf jî hene û dê bi derbasbûna demê re hebin.

**Dijber û dema nû**

Êdî nebûna hêzên Amerîka di qada Rojava û Başûr de hêz û wêrekiyeke nû daye dijminên doza Kurdistanê. Lê ger rejîmên totalîter û xwepeerest ên ku Kurdistan di nav wan de hatiye parvekirin, dîsa weke berê meşa xwe ya nerast bidomînin û li hemberî guherandinên demokratîk li ber xwe bidin, hingî di pêşerojê de civak dê dîsa li dijî wan rabe ser pêyan.

Ger ew bixwazin li dijî kurdan tund û tûjiyê bi kar bînin li rex reaksiyoneke dijwar dê şerê di navbera komên etnîkî û olî de jî hêdî hêdî xwe bidin nîşandan. Ev şer carna dê li dijî desthilatdariya wan jî xwedî xebat bin. Di vê navê de bi taybetî jî civaka kurd xwedî potansiyeleke mezin û nêrîneke hesas e. Rewşa taybet a nav welatên herêmê dê bi van pirsgirêkan re rû bi rû bimîne. Ger pirsgirêka kurd û Kurdistanê neyê çareserkirin, kirîzeke çend serî dê berfirehtir jî bibe. Kurdistan weke pireke di navbera Asya Navîn, Rojhiata Navîn û Ewropa de dê di guherandinên pêşerojê de xwedî roleke diyar û berbiçav be. Kirîzên zêdetir ên aborî, siyasî û civakî li herêmê niha di rê de ne, çêdibin û pê re jî rewşa siyasî li hemû herêmê tevlihev tê ber çavan. Bîr, raman, nêrîn û reaksiyonên gelên herêmê yê ji ***"guherandinên pêşerojê"*** re bibine bersivên tije asoyên geş ji wan gelên ku dixwazin qedereke tije bextewerî ji xwe re diyar bikin. Niha jî li Rojhilata Navîn ***"girêyên kevin û kor"*** ên jeopolîtîk nehatine vekirin. Di vê navê de li hemberî guherandinên pêşerojê Kurdistan welatê herî stratejîk e. Êdî di nav sinorên rejîmên ku textê wan bi nextê xwîna hezaran kesan re ketiye liqîn û hereketê: xwenaskirin, heza ji ziman, çand û nasnameya neteweyî" pareke cudanebûyî ji zanyariyên stratejîk e. Çareserî û asayîş dê wiha hêsan nebine para aliyên azadîxwaz ku li pey armancên pîroz û demokratîk in. Yanî carna pêkan e bi bedelên mezin jî nekivin destan, lê şopekê jî li pey xwe dihêlin ku nayê jibîrkirin. Her hêzek a weke bizava azadîxwaziya kurd ger di nexşeya siyasî ya cihana pêşerojê de li ber çavan neyê girtin, dê xeter û ziyanên mezin jî bi xwe re biafrîne. Agirê van ziyanên mezin dê tenê nebe para kurdan. Rejîmên dîktator zêdetir divê gelên herêmê vê rastiyê bizanibin ku li Rojhilata Navîn sîstema aborî, siyasî û civakî bi metirsiyên mezin re rû bi rû ne. Cîhanê jî çav li bazara petrol, hêza kar û serûkaniyên wê ye. Faktorên din jî hene ku dikarin siberojê ji nişka ve li hole bihêle.

**Nirxandina rewşa niha**

Nirxandina vê rewşa niha li herêmê û bi taybetî jî li Rojhilata Navîn pêwîstî bi karê hevpar ê partiyên siyasî û hêza hemû gelê kurd heye. Ger derfetên herî biçûk durist neyên bikaranîn, dê hemû berjewendiyên komî ji dest biçin. Mixabin siyaset û kiryarên partiyên ku îro li hemû Kurdistanê di nav kar û xebatê de ne, zêdetir ji wê ku li pey bersiva daxwaz, rexneyên gel û civakê bin an jî bejewendiyên neteweyî ên gelekî 50 milyonî di bîra wan de bin, zêdetir mijûlî hinek armancên xwe yên sînordar in. Ger bi stratejiyek hevgirtî, hêzeke yekbûyî û henaseyeke teze hemû li pey armanceke hevpar nebin, êdî ew jî li hemberî dîroka mirovahiyê hem şermizar û hem jî zû meşrûiyeta xwe wenda dikin. Divê bi nêrîneke rewşenbîrane rêyên tije astengî bêne dîtin û tenê hêzeke yekpar jî dê bikaribe wan astengiyan li ser rêya serkeftinê hilîne.

Bi her awayî li pey van gotinên jor, an em ê bi yekitî û hevgirtî bin, an jî berbelav û ji hev dûr bikevin û encama van jî tenê ***"azadî û koletî"*** ye. Her du rê jî li hemberî me vekirî ne. Hişyariya civakî jî şertekî bingehîn ê vê serkeftinê ye.

Van rojan li ser rewşa Rojava helwest û gotinên hinek kurdên xulamok û caş-belaşên xayin, ev gotina Simkoyê Şikak a berî 100 salan dikeve bîra min: ***"Ji her kesî zêdetir kurd ji bo xwe xerab in. Pişta hev nagirin, hînî xizmetkariyê bûne, baweriya wan bi xwe tune ye û mezinatiya hevdu napejirînin…"***

